

# Kindy li

# Queenslandê

## Kindy çî ye?

Kindergarten, ku bi navê kindy, tê naskirin, bernameyeka fêrkariya nivdemî jibo zarokên qonaxa Pêş dibistanê ye. Bi beşdariya li bernameya kindy hûnê vê derfetê bidin zarokê xwe da ku ji riya lîstinê were fêrkirin û bona çûyîna bo dibistanê amade be.

Bernemayên piştrastkirî yê Queensland Government -yani bernameyên kindy li ser mijara lîstinê ne û ji aliyê fêrkarekî biezmun û pispor li warê fêrkirinê di destpêka zaroktiyê da tînin fêrkirin. Bernemayên fêrkariyê yê Kindy dikarin li navendên perwerdehiyê yê destpêka zaroktiyê, hin dibistanên dorhêlî yê bi mesafeya dûr, û bi fêrkariya ji riya dûr an eKindy bona hin zarokên ku nikarin herin van navendan, bîn dabînkirin.

## Fêrbûn li kindy

Li kindy, zarok ji riya lîstinê va tînin fêrkirin da:

- bi bikaranîna ziman, fikr û hestên xwe derbibirînin
- hevalan bibînin, bi yê din ra bilîzin û di komê da hevpişk bin
- ji riya tecrubeyên nû, fêrî tiştan bibin
- pêbaweriya wan bixwe zêde bibe û bihêz bin
- hestên xwe ji riya honer, reqs û şanoyên drama derbibirin
- bîngeha zanista xwe damezirînin, fikrên nû biafirînin û alîkariya wan were kirin da ku destpêkeka baş li dibistanê hebin.

## Çawaniya navnivîsînê

Li Queenslandê, zarok dikarin bernameya kindy ji sala beriya çûyîna dibistanê va dest pê bikin. Her çûreya xizmetan ciyawaz digel xizmeta din e û hin ji wan rege lîsteya çaverêbûnê hebin, loma baştir ev e ku bi beşa xizmetên kindergarten ya bijartiya xwe tînkildarî baştirîn dema navnivîsîna zarokê xwe biaxivin.

Jibo beşdarbûna li kindy, zarokê we divê heta 30ê Hezîranê bûbe çarsalî.

Heyama Jidayîkbûna zarok	Zarok dikarin li kindy
1 Tîrmeh 2013 heta 30 Hezîran 2014	2018
1 Tîrmeh 2014 heta 30 Hezîran 2015	2019
1 Tîrmeh 2015 heta 30 Hezîran 2016	2020
1 Tîrmeh 2016 heta 30 Hezîran 2017	2021
1 Tîrmeh 2017 heta 30 Hezîran 2018	2022
1 Tîrmeh 2018 heta 30 Hezîran 2019	2023

Belgeyên pêwîst jibo navnivîsîna zarokê we:

- nav û navnîşana zarok
- agahiyên we wek sergêr, qeyûm an welî
- her çûre agahiyên tînkildarî hukmê dadgehê an bername an destûrkara dayîk û bavan
- agahiyên tînkildarî babetên taybet (Weke bêşyanbûn, hestiyariyên xwarinê û hwd)
- belgeya roja jidayîkbûnê (Wek nasname)
- rewşa saxlemî û sigortayê
- agahiyên tînkildarî vê yekê ku çî kesan destûra xwe heye li dû zarokê we bîn û hejmara tînkildarî li babetên awarte.

Agahiyên we dê nihênî bin. Her wiha hûn dê bikarin bi tamî berbihuriyên zarokê xwe bibînin.



